
Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.


Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (153) Sal 27 06 Rezber 2022 z - 2634 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S


# Şer ben li stoyê gelan digerîne!



## Desteya sernivîser

Serpêhatî û bûyerên dîrokî tekez dikin ku di siha şer û pevçûnan de, tewanên mezin ên xwîndar dij mirovan çêdibin, welat wêran û gel taromar dibin, nirxên mirovatiyê ji civakan bar dikin, abor têk diçe, belengazî û perîşanî konê xwe vedigrin, kavilên wêran di nav toz û domanê de dimînin û hawîr bîna mirinê difûre!

Wekî tê zanîn, di şerê cîhanê yê duwem de ku 6 salan dirêj kiriye, /70/ milyon mirovî jiyana xwe ji ..... 2

## Dr. Nûredîn Zaza dê her û her di bîra me de zindî bimîne!


Piştî bidawîhatina hevdîtinên Lozanê, hevalên Rêxistina Ewropa ya Partiya me, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, sekreterê yakemîn Partiya Kurdî Li Sûriyê Dr.Nûredîn Zaza jibîr nekirin, serdana gora wî kirin û bi rêzgiritin ew bibîr anîn…



Çawa mirov dikare ked, cefa û azara Dr.Nûredîn û hevalên wî yên dilsoz jibîr bike!, ew ên ku ji bo me, ji bo welatê xwe û paşeroja gelê ..... 2

## 49 Saliya Koçkirina xebatkarê Kurd ê navdar Dr. Nûrî Dêrsimî

Avdara sala 1894an, li gundê Axzonîkê –parêzgeha Dêrsimê, Nûrî Dêrsimî ji bavê xwe Îbrahîm û diya xwe Zelîxe re çêdibe, li dinê çavan vedike. Xwendina xwe ya seretayî li gundê Xûzatê û ya navîn li Xarpîtê diqedîne, paşê, sala1911an, ew diçe Stenbolê, zanista bijişkiya ajalan dixwîne. Hê ji ciwaniya xwe ve, bi temenê xwe yê piçûk, ew



tevî refên kar û xebatê bûye. Sala 1918an, ew di Komela Bilind a Kurd de, ya ku bi pêşengiya siyasetmedar û zaniyarê Kurd ê gewre Seyid Ebdilqadir Kurê Şêx ..... 2

**Şer ben li ... Dûmahîk**

dest daye, aboriya cîhanê bi tevayî, û ya Yekîtiya Sovyetistanê û Dewletên Ewropî bi taybetî, ketiye kirîzeke mezin û hawîr birçîbûn belav bûye, û bi armanca girtina rê li pêş derketina şer û pevçûnan û parastina aştiya cîhanê û geşkirina hevkariyê di navbera dewletan de ji bo çareserkirina gelş û pirsgirêkên mezin mîna xizanî, nexweşî û parastina jîngehê, li roja 24ê Çiriya Pêşîn a sala 1945an, Rêxistina Yekîtiya Netewan(UN) hatiye damezrandin.

Di serdema me ya îro de, ew rêxistina navnetewî ya ku peywendî di navbera dewletan de birêxistin dikirin, aştî û aramiya cîhanê diparast, îro lawaz û kêmrol bûye, rêjeya ezîtiya malxuran li ser asta cîhanê bilind bûye, di pişt perdê re, xwediyên kartêl û fabrîqeyên çekan siyasetmedaran berew pêxistina şeran têve didin, aramî û pêkvejiyana gelan serûbin dikin.

Ji bilî kuştina mirovan û rijandina xwîna jin û zarokan û kuştarên kesnedî yên dûrî sinciyên mirovan, eger ew pereyên li şeran têne xerckirin, ji bo avakirina projeyên geşepêdanê, belvkirina zanînê û parastina jîngehê bihatana xerckirin, dê rewşa gelên cîhanê bi tevayî berew xweşiyê û aramiyê çûba.

Bêgomane, çi li vir, çi li wir, dê nakokî di navbera dewletan de derkevin holê, ev pirseke normal e, lê çareseriya wan nakokiyan ne bi şer û hilgirtina çekan e, lê gereke ew bi gotûbêj û şêweyên diyaloga aştiyane di hêwana Yekîtiya Netewan de çareseriyê bibînin. Eger vîna navnetewî li ser hev be, dewletên mezin ji dil bixwazin van şeran rawestînin, bi hêsanî ew dikarin vî karî bikin, lê, ew berjewendiya destelatên xwe diparêzin, ne ya gelên xwe, çimku li ser asta dûr, berjewendiya hemî gelên cîhanê, gelê Kurd jî di nav de, di aştî û aramiyê de ye.

Di tunebûna yasa û zagona navnetewî de, rê û derfet li pêş diktator û xwînrêjan dûz dibe da ku ew kuştaran dijî gelan çêbikin, mîna çawa diho Sedam Husên Li Îraqê, û îro jî Erdoganê ku tunekirina gelê Kurd ji xwe re kiriye armanca serke, bê tirs, bê şerm û fedî artêşa wî sînorên welatan derbas dike, xaka wan zeft dike, li dijî sivîlan tewanan bikar tîne û hêminiya deverê û ya cîhanê ser û ber têkdibe, dihejîne.

Bi kurtî, mirov dikare bibêje ku, ji bo rawestadina şer giring e dengê hemî aştîxwazên cîhanê bilind bibe, çiku şer, ben li stoyê gelan digerîne, jiyana wan dike dojeh!

**Dr. Nûredîn ... Dûmahîk**

xwe, hemî jiyana xwe terxandibûn?!.

Emê rêya Dr.Nûredîn Zaza û mezinên xwe bişopînin, û ji bo pêkanîna armancên wan ên mirovane, her têbikoşin!

**49 Saliya ... Dûmahîk**

Ubeydellahê Nehrî birêve diçû, dibe endam, û da ku gelê xwe ji bindestî û koletiya reş rizgar bike, zend û bendên xwe badide û bi dilsozî xebatê dike, û ji ber çalakiyên xwe, ew tê binçavkirin. Radibe ji Stenbolê derdikeve, diçe welatê bav û kalan, û li Dêrsimê cîwar dibe.

Ew û hevalê xwe Elî Şêr, bi hev re, kar û barê serhildana Qoçgêriyê dikin, ewa ku 6ê Avdadra 1921ê destpê kiriye, û bi tundî û hovîtiya dewleta Tirk di nav xwînê de maye. Li wir, ew ji bal polîsên Tirk ve tê girtin, lê bi alîkariya Seyid Riza serbest tê berdan. Girtin û zindankirina wî, hêvî û moralên wî naşikîne, û her ew têkoşîna xwe ya netewî berdewam dike. Dema serhildana Dêrsimê sala 1937an destpê dike, ew dibe yek ji rêberên wê yên sereke.

Mixabin, dema serhildana Dêrsimê têk diçe, ew neçar dimîne, berê xwe dide binxetê, ji wir diçe Urdinê, û sala 1940î, li tataxa «Miheta Bexdad», bajarê Helebê cîwar dibe, kar û xebata rewşenbîrî û ramyarî didomîne.

Gelek Kurdên Kurdax, Heleb û Cizîrê li mala wî civînên Kurdewariyê girêdane, li ser destên wî fêrî zimanê Kurdî bûne, ji kaniya zanîn û ezmûna wî ya Kûr sûd wergirtine. Berî ku ew koça dawîn bike, wî sala 1963an gora xwe û ya hevjîna xwe li rex hev, li goristana «Henan», ya nêzîkî bajarê Efrînê kolane, û ev rista jêrîn ku ji bal Dr. Nûredîn Zaza ve li ser kêla wî nivîsandin:

Li ser vê riya dijwar, min jî kire pir hawar
Da ji bo we rojekê, dinya bibe gulbihar!

Roja 22ê Tebaxa 1973an, li Helebê, dilê vî lehengê Kurd radiweste, çavan digre û ji vê gerdûnê bar dike.

Bila cihê wî bihuşt be, gelê Kurd tucarî mezin û lehengên xwe jibîr nake.

**Li bajarê Bonê 77 Saliya P.D.K Îran hate vejandin**



Li 26ê Tebax (Gelewêj) ê 2022an li Köln(Koloniya) Almaniya bi beşdariya girseyeke ji herdû aliyên P.D.K îran yên li vê dawiyê gavine rast û dirust berve yekrêziyê avêtine hate vejandin. Vestîval bi sirûda Eyreqîb dest pê dibû pişt re gotina .....

3

# Ma rast e dijmin nahêle em li hev bikin?

**Zanistê Cûmê**

Wek tê nasîn, ji berê paşê de dijminê her tuştekî û heyberekê di jiyanê de gerek hebe, ta ku jiyan şên û berdewam bibe. Vêca dijminê lawiran, him lawir in û him jî mirov in, û yên kurmikan him teyr û çûk in û him jî mirov in, û yên teyran him teyr in û him jî mirov in, û yên mirovan mirov bi xwe ne, bi giştî mirov kane bêje ev mirovê bi nav û deng û li ber dilê yazdan gelek buha û bi nirx, dijminê yekemîne ji hemû lawir, mirov, keskayî û ta çem û kaniyan ne. Vêca her yek ji wan lawir û mirovan bi awakî berxwe û berevaniya xwe dike, ta lawir li hev dikin û giropekî û pêşengekî didin pêş xwe û li pê dimeşin.

Di baweriya min de ne hewcedarî pirsê ye, ku lawir yan mirov wê pirtir kanibin li hev bikin?

Lê mixwabin û sed carî mixwabin di vê rewşa nazik ya ku sûryê û bi teybatî tevgera kurdî têre derbasdibe de, xuya ye lawir in me bêtirî mirovan kanin li hev bikin. Girêk û asteng ne hebûna du rêbazan di nav tevgera kurdî de ne, yek tê naskirin bi navê berzanizmê û yek bi navê apociyan, ez dibînim pir tuştekî normale du û sê rêbaz û êdolîcî hebin, ji ber ku li seranserî welatên cîhanê tim û tim hin ji wan destlata welêt dikin û yên din oposizuyan wan dikin, û di pir car û mofirkan de li tûkên hev digerin.




Lê bi tucarî çênabe û ne jî dibe yek ji wan bi dijminê bav û kalan re bişimite, berjewandî û ewlakariya netewiya welatê xwe di ser hemû nakokiyên xwe re bigrin.

Wek tê gotin ma rast dijmin nahêle em li hev bikin? Biraderê mino navê te çidibe berzanî, ocelanî çep û rast bila bibe ne xeme, lê bila ji bîra min û te nere li dawiyê em tev kurd in û welatê me Kurdistan e, û berjiwandiya me Kurdan û bi teybat Kurdên sûriyê di ser berjiwandiya hemû welat û partiyan re ye.

Gava hiş û mêjiyê me li cî be û ne leqleqokî be, û destê me ne di berîkê biyaniyan de be, emê çima li hev rûnenin û li hev nekin? Xuyaye derd û kulên me ji min û tene, gava me tevan soz û civat li çol û li nav çiyan dikirin, xwepêşndan û rewstandin li pêş dadgeh û perlemantan dikirin dîsa dijmin hebû û ji niha bi hêztir bû, lê me dikir û em serkeftî bûn.

Sala 2004 an baş tê bîra we tevan, hinan nav lêkir serhildan û hinan jî lêkirin bûyer û hinên din jî lêkirin şoreşa Kurdan û di wê demê de, detslata sûiryê ji niha bi pirî bi hêztir bû, lê dîsa bi serkeftî tevgera kurdî derdora salekê daxuyan bi navê komek partiyên Kurd diweşandin û kanîbûn li hev bikrana û li gel hev civat girêdidan û şêwir dibû, ji ber ku biryara tevgerê li Efrîn, qamişlo û Kobaniyê bû. Carek din ma rast dijmin nahêle em li hev bikin?

Ez di wê baweriyê de me, ta ku em Kurd bi navê partiyan û kesayetiyan tên naskirin û hin ji partiyan destên xwe di beriyê berazaniyan û oceleniyan de ne, emê nikanibin ne li hev bikin û ne jî piyalek çayê bi hev re vexin.

Vêca ta em kanibin li hev rûnin û guhdarî hev bikin divê em nasbikin derman çiye?

1- Gerek bawerî li ba me hebe bi tucarî kes nikane, ne ji dijminê Kurdan û ne jî Kurd bi xwe ku berzaniyan yan ocelaniyan ji holê rake yan biherifîne.

2- Berjiwendiya ewlekariya netewî ya kurdî di ser berjiwendiya partî û tevgera kurdustanî re ye.

3- dijîtiya raghandinî di navbera tevgera Kurdustanî de û bi teybat di navbera ocelaniya û berzaniya de bê rewastan.

4- Berjewandiya gelê Kurd li sûriyê li pêş berjewandiya hewlêr, amed û mehbadê de ye, ji ber ku ger tu nikanibî ji Efrînê hezbikî tê nikanibe ji Hewlêr û Diyarberkrê jî hezbikî.

5- Komek ji kesên serbixwe ne ji dûvçilkan! vexwendina civatek bê birayar rû li rû bikin.

De vêca ka em van çend xalên me jimartine bi dê û bav bikin, ji ber ku hemû xal di destê me de ne, ne di destê dijmin de ne. Wê demê emê naskin ma rast dijmin nahêle em li hev bikin yan derd û kul di mêjiyê me de ne?!

**Li bajarê... Dûmahîk**

deftera siyasî (polît-Birû) û serkirdeyetiya rêxistina awropa li Almaniya bû. Hêjayî gotinê ye beşdariya hevaljîna pakirewanê navdar Elheyderî Ciyekî balkêş digirt.

-Bijî P.D.K îranê di salvegera77an de.
-Serkeftin ji gavên yekîtiyê di navbera herdû basikên P.D.k. Îran.
-Bijî Kurd û Kurdistan.

***Melek Murad***
***Şarî Bon***

# Ta ku em Kurd wehabin, emê tim bindest û kole bin

**MEMÊ ALAN**

Bi sedsala ne siyasetên dijmaneyetî û pilanên tunekirin û qirkirinê yên rêbazkirî, ji aliyê dijminên me Kurdan ên dîrokî ve, di dermafê gel û welatê me de têne meşandin, mîna kuştin, komkujî, talankirin, şewtandina gundan, koçberkirin, destdirêjiya namûsê, guhertina demografî û endeza niştecîbûnê...û H.W.D.

Vêca pirsa herî mezin, çima ta niha em weha bindest mane? Em Kurd di bersivdayîna vê pirsê de, tim dikin stûyê dewletên xwedî bandor û dibêjin ew ji me re nabin palpişt û alîkar, an jî em dibêjin dijminê me ji me bi hêztir e, û sûcên xwe jî ji bîr dikin û xwe lome nakin!

Belkîm hin jî bipirsin çima em weha ne, û bi sedhezaran xwendevanên me yên asta xwendina wan bilind hene? Erê ez jî dibêjim xwendevanên me pir in û gelê me ji xwendinê hez dike, û ev rûdana pêngaveke erênî û nîşana xêrê ye, divê em jê re palpişt û piştgir bin, lê ev nayê wê wateyê ku em Kurd derbasî qonaxa zanebûn, dûrbîn, hişyarî û hişmendiyê bûne, û em çep û rastî, xêr û şer û kar û zirarê xwe ji hev dikin der. Çimkî kiryar û tiştên li ser erdê di nav me de dibin, tekez dikin ku hîn em tênegihîştine. Mînak jî gelek in, divê em wan nas û destnîşan bikin. Bi nêrîna min:

- Ta ku endamên yekmalbat -bav, dê, zaro, bira, xwîşk, xal û xwarzî, ap û birazî...û H.W.D- nikanin gelşe û kêşeyên xwe bi hêsanî di nav xwe de çareser bikin -bê ku hin ji derveyî malbatê bibin navbêncî, yan jî giliyan li hevdu vekin- û dawiya her kêşeyêkê jî dibe qehir, zikdirî û qutkirina têkeliyan, emê tim bindest û kole bin.

- Ta ku cîran bi cîrên re, bê nakokî, dijmantî û destêwerdanên ji derve ve nikanin çaran ji pirgirêkên xwe re bibînin, û kîn û zikreşiyê derbasî nav nifşeke nû dikin, emê tim bindest û kole bin.

- Ta ku karên hevbeş -Aborî, civakî, ramyarî, çandî, sivîlî...û H.W.D- di nav me Kurdan de kêm in, û yên hene jî dirêj nakin û ne serkeftî ne, emê tim bindest û kole bin.

- Ta ku alozî û kirîzên ku di hundir partiyên me de derdikevin -çi kesayetî yan nêrînî bin, û çi di nav du endaman de yan jî di nav du komên endaman de bin- bi şêwakî rindik - bi danûstandin û gufûgoyên hevaltî û biratî- çareser nebin, û her aliyek dibêje ez li ser rastiyê me û ji ya xwe hema santîmekê danagere, û li dawiya dawî jihevdûrketin û jihevqetandin çêbibe -zatirê kirîza pirpartiyane ya tevgera me ya Kurdî li Sûriyê encama vê nexweşî û nezaniyê ye - emê tim bindest û kole bin.



- Ta ku Tevgera me ya Kurdistanî û ya Kurdî li sûriyê di nelihevkirina xwe de berdewam in, û hin ji me li şûna destên xwe bidin hevdu, derin destên xwe didin destên dijminên gelê me yên dîrokî, da ku kîn û zikreşiya xwe li kes û aliyên ku ne li gor bîr û bûçûnên wan sax bikin -encam jî ne xem be ku qirkirin û tunekirina gel be- emê tim bindest û kole bin.

- Ta Ku em wek Tevgra Kurdî -siyasî, rewşenbîrî, sivîlî...û H.W.D- yek xwe ji yekê ranakin û ders û îbretan ji serpêhatiyên derbasbûyî hilnînin, û dest nadin hev da ku em gel û welatê xwe ji hovîtiya dijminan biparêzin, emê tim bindest û kole bin.

- Ta ku hesûdî di nav me de heye, û em nikanin ji serkeftinên hevdû re şa bibin û ji binkeftinên hev re jî xemgîn bibin, emê tim bindest û kole bin.

Û zincîra nezanî û ehmeqiyê di nav me Kurdan dirêj e.

Vêca ev rûdanên pîs û qirêj ên ku me anîne zimên û yên bilî wan ku me nanîne zimên, û ta niha me nikaniye xwe jê rizgar bikin, bi giştî encama nezaniya me ne... Ji ber wê divê em lixwenin ku em nezan in, da ku em kanibin li çara serê xwe bigerin, û em kanibin ji bindestî û koletiyê rizgar bibin.

## Li Almanya heval Ebûd Zekî Mihemed çû ber dilovaniya Xwedê



Piştî berxwedanekê bi êşa penceşêrê re, roja 25.08.2022an, li Hanoverê/ Almanya, dilê heval Ebûd Zekî Mihemed rawestî û xatir ji gerdûnê xwest.

Li bajarê Serê Kaniyê, sala 1972an, Hevalê Ebûd, hatiye dine û sala 1990, tevlî rêzên partiya me bûye. Çimku guhdaneke wî ya taybet bi folklore Kurdî hebû, digel hin heval û hogirên xwe Koma Mîtan a dîlanê damezrandin, û ji ber xebat û çalakiyên xwe, li ser destê rijêmê gelek caran zindan bûye.

Cihê wî bihuşta berîn be, serê malbat, dost û hevalên wî sax be.

# Berê Xweseriya Demokrat bi ku de ye?

**Mihemed Qere Hesen**

Li destpêka, bayê azadiyê li piraniya dewletên Ereb xist, gelên van welatan daketin kolanan û bi şêweyê aştiyane doza rûxandina hekûmetên ku gendel, kufkî û genî bûne û destên wan bi xwîna hemwelatiyên xwe sor bûne kirin, doza avakirina dewletên demokrat kirin ku ew ji jiyana ne mervane rizgar bibin, maf û rûmet wan lêvegere.

Ev liv û tevger di 2011 an de li Sûriyê dest pêkir, û bi şêwekî aştî û gelêrane û bê pilan û rêxistin di şarêyan re herikîn, û çavên dewletên herêmê û yên mezin li vê tevgerê bûn. Li gor cihê Sûriyê û demê zû, zû guhartina rijîma wê ya konevanî netê guhartin.

Di vê keftlefê de, dewletên destêwerdan rewşa Sûriyê kirin, bi taybet dewleta Tirkiyê û yên Kendavê, hêzên îslamî nemaze rêxistina Îxwan Emislman ber ve xwe kişand û digel rijîmê ew berve şerê çekdarî têvedan, piştgiriya wan a leşkerî û diravî kirin, liva gelêrî ya aştiyane ji rê bi derxistin û eniyan wan dan kuştinê, bi vê kiryarê re biryara niştimanî ya serbixwe ji dest wê tevgerê hat girtin, û ew wek Kaxetek zorê bi dest xwe xistin. Û ji wan rêxistinên îslamî yên tundrew wek DAIŞ û Cebhit Elnsre û nola wan li dijî hundir û derve çêkirin, û ji hemî aliyan ve dest bikuştar û babelîta gelê sûrî bi hemî şêweyan kirin.

Di vê qonaxê de Rûs, Tirk, îran, û Emrîka bi hêz destêwerdana tentêla hundirê Sûriyê kirin. Û du alî aşkere bi ser bûyeran ketin. Yek alikî dînî tundrew hovane, û piştgirî wan kirin. Didu aliyê dest berdan wan bi tundî ji deslat a rejîmê û ne dirust û çaksazkirina wê. Herdu aliyan milet pir civlandin, û bihna guhartinek erênî û demakratkirina Sûriyê ji wan nedihat, berve dewleteke dînî hişk û paşmayî kirin. Li hember wê pirojeyên tundrew, hevbendiya navdewletî bi serkêşiya Ermrîka û Netewên Yekbûyî di rêya biryara 2254 re doza çareserkirin gelşan û demokratkirinê kirin. Û hevbendiya navdewletî dest bi avakirin hêza Sûriye Demokrat ji piraniya netewên sûrî kirin, ku pê şerê DAIŞê were kirin û bibe motik ji Sûriya nenavendî û democrat re, ku sibe şûna herdu pirojên dernexwîn bigire, ew hêza leşkerî hatî avakirin girîngiyek çêbû ku pirojeya xwe ya konevî cihê xwe bigire, divê nûnertiya xwe jî hebe, ji ber wê pir dirêj nekir, MSEDê wek sîwana konevanî ji hêza QESEDê re hate damezrandin.

Gava QESEDê û MESEDê û diwarê kargeriyê de xweseriya Demorat hatin damzerandin, tavilê bazirganên Esîtene bi bibve û îjdiliya wê bi guhartina Sûriyê hay bûn. Wan dest bi dek û dolab û dijîtiya wan bi hemî şêwan şer kirin û hêjî tê kirin.

Ev hersê alî QSEDê, MESDê û Rêvebiriya Xweser wek saziyên niştimanî hatin çêkirin. Roj bi roj cihê xwe di tentêla Sûriyê di hemî waran de digire. Û dostên xwe li der û hundir çê dibin, kar û ustbariyên xwe di vê rewşê mûzmehlî de giran û mezin dibin. Di vê pêvajo û rêçûnê bi xwe re kêmasî û şaşî çêbûn. Ta ev pêvajo rast û durist berdewam be, giringî di her alîkî de lêveger çêbibe.

1. **Aliyê konevanî.**

Wek berê me nîşan kirî ku MSEDê xwediyê pirojeya demokratkirina Sûriyê ye. Di vî alî de hêj pir alî niştimanî û kes li dor vê pirojeyê kom nebûne, çi li derve û çi jî li hundir, ev pêdiviya çalakên konevanî pir divên, têkilî û hevdîtinan bi aliyên niştimanî din re di nav hemî pêkhateyên sûrî de were kirin û fere bibin. Niha rewşa gelêrî yên di bin destê Turkiyên de ne li serhev in li dijî kirarên hukmeta turkiyê ya dagîrker xwe pêşandan dikin ta ala wê şewitandin. Ev hukmeta beşekî mezin ji xaka Sûriyê bindest kiriye, û biryara wan jê standiye, naman ji Dîmeşqê re di rêya têkiliyên ewleyî û axaverên wan re ku derfet heye li hev werin. Vê bi xwe re ewrekî tarî anî ser hişê rikberiya îslamî ku pûştî li wan tê kirin. Ev jî derfetê ji aliyê pirojeya nîştimanî re vedike, ku destê xwe dirêj wan kes û aliyên destên wan bi xwîna Sûriyan sor nebûye bike, ku ji dev û destên hukmeta Turkiyê bi derxîne û cilê ji bin lingên wê bikişîne, û li dor pirojeya niştimanî kom bikin di rêya kongirekî netewî Sûrî re û li ser axa welêt çêbibe, û rola MESEDê bi hêz, fere û çalaktir bibe, û pir pêkhateyên konevanî derbasî wê bikin. pirojeya nûkirina Sûriyê zelal û aşker were pêşangkirin, ku hemî pêkhatên welêt berjewendiyên xwe tê de, di rêya belgeyên wê re bibînin, çi navê wê girêbesta civakî an jî derstûr… be. Ji ber ku hîm û bingeha ramanî û dezgeya rijîma Sûrî li ser ava bûye, ku tu kes û pêkhatan bilî xwe nepejirînin, û hema hemî çareyan di rêya ewleyî re dibîn, ew jî sersedemek bû ji babelîta gelê sûrî re. Li ber vê nêrînê ta hêzek îjdil û xurt li hemberê çênebe wê têklî û danstandin vê re nehêsan bin.

Li aliyê kurdî li MESEDê û QESEDê dikeve, ku şan û sembolên xwe yên netewî û li derveyî Sûriyê li serê pêkhatên din feriz nekin. Ji ber ku her pêkhatekê sembolên xwe yên netewî û dînî hene, û hest û nesta wan î .....

6

# Xwekujî

Nazdar Hesen

Civaknas, xwekujiyê weke kuştina mirovekî ji bo xwe pênase dikin, xwekujî bi armanca bidawîkirina jiyana xwe bi gelek rê û rêbazên zirarê bi xwe dike hinek kes bi avêtina xwe ji bilindahiyek bilind, an bi xwarina madeyek jehrê, an bi karanîna amûrek tûj an jî bi çekê xwe dikujin.

Helbet gelek sedem hene ku hişê mirov dihêlin tiştê ku hişê mirovê saxlem qebûl nake ew bike, yek jê rewşa aborî ya xirab yên tê re derbas dibin, dema nikarin pêdiviyên jiyanê bi cih bînin, û debara malbatên xwe peyda bikin, dên li ser pir dibin û ew dixwazin xwe ji holê rakin û çareseriya xwe di xwekujiyê de dibînin, û dibe ku mirina mirovekî delal an derbasbûna wan di bûyerek evînî têkçûyî de, bibe sedemek ji xwekujiyê re, û pir caran pirsgirêkên di têkiliya kesane de, di vê çarçoveyê de rolekê dilîzin. Ji ber wê jî em dikarin bibêjin xwekujî bi gelemperî ji bêhêvîtiyê tê kirin, û bêtir jî bi nexweşiyên derûnî ve girêdayî ye.

Û ji ber ku bûyerên xwekujiyê di nav civakên me de vê dawiyê bi awayekî berbiçav zêdetir dibin, divê civak û dewlet li dijî vê diyardeyê lêkolînan bike, sînordarkirina gihiştina çekan, dermankirina nexweşiyên derûnî û her weha başkirina pêşkeftina aborî bike.

## Hevdîtinek bi Nivîsgeha Peywendiyên Niştimanî Û Kurdistanî ya Partiya Demokrata Kurdistanê-Iraq kir

Di çarçewa pêşvebirin û geşkrina peywendiyên Kurdistanî de, li beyaniya vê rojê, roja yekşembê 21.08.2022 Z, şandeke Partiya me, Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê(YEKÎTÎ) hevdîtinek bi Nivîsgeha Peywendiyên Niştimanî Û Kurdistanî Ya Partiya Demokrata Kurdistanê-Iraq kir.

Şanda Partiya me ji van hevalan pêkhatî bû:

Mehmûd Mihemed/ Endamê Komîta Siyasî û Berpirsê Partiyê li Herêma Kurdistanê. Weys Mustefa/ Endamê Komîta Birêvebir a Partiyê. Heval Hesen Çawîş/ Endamê Serkirdayetiya Rêxistina Herêma Kurdistanê.

Şanda Partiyê ji bal Rêzdar Elî Hesen/Serokê Nivîsgeha peywendiyan. Birêz Nîzar Botanî/Berpirsê Dosya partiyên Kurdî û hejmarek ji endamên Nivîsgehê ve bi germî hate pêşwazîkirin.

Di vê hevdîtinê de, bi boneya 76 saliya damezrandina Partiya Demokrat a kurdistanê, Şanda prtiyê pîrozbahiyên xwe pêşkêşî hevalan kir, paşê, li ser pirsa Kurd û Kurdistanê bi firehî gengeşe û gotûbêj çêbû, herweha amaje bi wê yekê hate kirin ku giringe di têkiliyan de, pêwist e taybetmendiya her parçeyekî welêt bête rêzgirtin, û têkiliyên Kurdistanî li ser bingeha hevrêzgirtinê bêne ristin û avakirin, û herdu aliyan tekez kirin ku ji bo pêşvebirina peywendiyên du alî, xebat berdewam be.

Pişt re, şandê xatir ji Nivîsgeha Pewendiyan ya Partiya bira xwest û hevdîtin bidawî hat.

Komîta Ragihandinê Ya Rêxistina Herêma Kurdistanê a Partiya Yekîtît Ya Demokrat a kurd Li sûriyê
Yekşemb: 21.08.2022Z

**Berê Xweseri ... Dûmahîk**

netewî were rêzgirtin û bihana nekin destên dijminê Kurd û pêkhatên din, ku nakokî û tîşan di navbera wan de çênekin. Ta ku nakokên serek winda nebin û bi ên hûrik de nikivin. Ev li alîkî, û li aliyê din jî pirojeya demokratkirina Sûriyê û nêrîna bîrdozî ya derveyî civaka sûrî kar li ser were kirin cihê xwe nagire, ji ber ku li gor bîrdozan, dem di ser rêxitinkirina civakan re derbas bûye. Gava civakên dinyayê dev ji bîrdazan berdane, û ji nû ve Kurd jî dest pê bikin, çiqas paşmaybûna nêrîna kovanî nîşan dide.

**2. Aliyê leşkerî.**

Ta roja Îro QESEDê wek hêzek niştimanî diyar bûye, ku ji ber axa gelê sûrî ve xwîn rijandiye, ku ji hêzên terorist û dagêrker paristiye û nas bûye. Ji ber ku ev hêz ne li ser bingeha bîrdozî, çi netewî û çi jî olî, û çi ji bona paristina deslatê ava bûye. Nav lêbûye hêza Sûriya demokratîkî, û li ser wê rêyê kar dike, û divê sibe jî xwe nexê nav nakok û gelişên konevanî, û bes li ser erkên xwe yên niştimanî bijî. Ta ku ev hêz bibe beşek ji leşkerê Sûriya niştimanî ya nû.

**3. Aliyê rêvbiriya xweser.**

Di van deh salên şer î borî de, civak û pêkhatên pir hatin civlandin û çirandin (kuştin, penaberkirin, guhartina demografî, dizîna mal û mewdanên bajarvanan…). Li gor vê xişma mezin bi serê gêlê sûrî bûye. Çarek di rêya Sûriyek ne navedî re, derd, kul, birîn xwe werin derman û çareserkirin, û mafên xwe werbigrin, û dilên wan vehese, û ji nû ve bi hev e werin girêdan.

Ev motik li rojhatî Ferêt hatî damezrandin, ta ku bibe çarek ji yektiya gelê sûrî re, gerek pêkhatên zorlêbûne wek wê xweserî li gor destûrek nû jê re çêbibin. Ta xweseriya heye xwe di çavên gelê sûrî de biçîne û bibe nimûnek serkeftî, divê hemî partiyên li deverê hene li gor girêbesta civakî heye têde hevbeş bin, û li ser bingeha demoratiyê (di rêya hilbijartinê re) cihê xwe têde bigirin. Ne di rêya alîk partiyên çûçik vê cemewer çêbike û li rex xwe dîne û bêje em lîska demokratiyê dikin. Ev nimûne partiya Be›is li serê eniya niştiman û pêşverû dimeşandin, partiyên din bêrol di wê eniyê da bûn, ne xwedî biryarên niştimanî sereke bûn. Divê sûde ji ve serpêhatiyê were dîtin.

# Hevpeyvîn bi nivîskar û helbestvanê Kurd Mehmûdê Sebrî re

*Nivîskar, helbestvan û kesayetiya civakî ya navdar, xwediyê 8 pirtrûkên çapkirî bi zimanê Kurdî û dehên gotar û pexşanan, ew kesê bi bîr û bawerî zanîbû ku Ziman, nasname û nîşana hebûna gelan e, û bi xwendin û zanînê rêya serbestî û azadiyê li pêş Kurdan dûz dibe, wî di wê qonaxa reş û tarî de, di dema tirs û qedexekirina zimanê Kurdî de, li kêleka hin welatparêzên Kurd barê giran hildaye ser milan û xwe fêrî zimanê Kurdî kiriye, pê xwendiye û nivîsandiye, nav di keç û lawên Kurdan daye ku ew jî li zimanê xwe xwedî derkevin, wî biparêzin û pêşve bibin.*

*Îro, apê Mehmûdê Sebrî, mêvanê rojnameya NEWROZ û xwendevanên wê ye.*



## Desteya sernivîser

*Tu gelekî bi xêr hatî mamoste, em hêvîdar in, xwendevanên weşana Kurdî Newroz, sûdeyeke qenc ji ezmûna we ya zengîn bigrin, û em ê bi kurtejiyana we dest bi vê hevpeyvînê bikin.*

• Navê min, Mehmûdê Sebrî ye, Sala 1937an, li gundê MELEK, nêzîkî Derbêsiyê, Parêzgeha Hesîça ji dayik bûme, di 13 saliya xwe de, li ser destê şêx û feqeyan, dest bi xwendina olî kiriye, û ji ber ku min li ser şewata sînemeya Amûdê nivîsandiye, ji dibistana olî hatime bidûrxistin. Di salên 1960î de, bi alîkariya Hemze Niwêran û Hemîd Derwîş, ku wan pirtûk ji min re peyda kirin, min bawernameya pola 9ê sitand û ji ber ku ez hevalê Partî bûm, rijêmê ez weke mamoste qebûl nekirim, rabû min berê xwe da bajarê Dêra Zorê û li wir 6 salan karê mamostetiyê kir. Di wan 6 salan de, min bekelorya stand, herwiha min bawernameya (Dar muelimîn) jî wergirt, û ji ber ku li wî bajarî kesî haj kêşeya Kurdî tune bû, min xebata xwe ji bo zimanê Kurdî pêşxist, paşê, ez vegeriyam Hesîçe û li wir min karê mamostetiyê kir, û digel rewşa min a aborî ya dijwar, min dest bi xwendina zanîngehê, beşê Yasa û Mafnasiyê kir û jê derçûm.

Li destpêkê, hêjayî gotinê ye ku digel hebûna cudahiyê di navbera zimanê axaftinê (zimanê devokî) û zimanê nivîsandinê de, ango zimanê Kurdî yê petî de heye jî, lê, em ji bîr nakin ku zimanê me Kurdî ye. Ez Kurd im, zimanê min Kurdî ye.

Ji bilî vê yekê, min 10 salan bi zimanê Erebî xwendiye û li ber destê şêx û meleyan fêrî feqetiyê jî bûme, lewra, ji wê demê ve min helbestên tesewifê mîna yên Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî … û hwd dixwendin, vê yekê hişt ku heskirina zimên di dilê min de mezin bibe. Herwiha ji ber ku min feqetî kiriye, ez li deverên Herêma Cizîrê geriya me û zaravayên wan nas kirine. Ji ber van sedeman, min ji zimanê dayikê hez kiriye û dest bi xebatê ji bo vejîn û geşkirina wî kiriye, hewl daye ku wî pêşve bibim.

*P1. Mamoste, gelo destpêkên fêrbûna te ya zimanê Kurdî têne bîra te? Rewşa civakî, asta zanebûnê, bandora û akama kê li te hebû ku evîna zimanê Kurdî di dilê te de mezin bû?*

• Dema ku min li cem mala Şêx dixwend, Mele Ebdullah…. tembiya min li mala Şêx Ehmedê Xiznewî kir û li ser xatirê wî melayê payebilind ez li dibistanê hatime bicihkirin. Lê, dema ku agir bi Sînemeya Amûdê ket û min li ser wê bûyera xembar nivîsand, ez ji dibistanê hatim bidûrxistin!

*P2. Di wê dem û qonaxê de, xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî li cem dezgehên dewleta Sûriyê sûc û gunehek bû, pirtûk û jêderên bi zimanê Kurdî pir kêm bûn. Çawa hun fêrî zimanê dayikê bûne?*

• Di salên 1960î de, min dest bi karê rêxistinî kiriye, di nava rêzên PARTÎ de cih girtiye, hin ji hevalên min gorbihuşt Hemzeyê Niwêran û Hemîdê Hec Derwêş bûn. Ji bo kar û barên Partiyê, çend caran ez çûme Başûrê Kurdistanê, di warê zimanê Kurdî de, min sûdeyeke baş ji wan serdanan wergirtiye.

Herwiha, çend caran çûme Bakurê Kurdistanê, li wir jî min sûdeyeke baş dîtiye, ku hêz dane min û ji bo min bûne bingeh û xurtî.

*P3. Ji bilî kovara HAWAR, RONAHÎ, ROJA NÛ…Helbest û dîwanên Seydayê Cegerxwîn, Mele Ehmedê Namî, Tîrêj, Melayê Palo, Bêbuhr, Mele Nûriyê Hesarî, Seydayê Keleş …HWD. Çi jêderên Kurdî di nav destên we de hebûn, kesî hun fêrî ziman dikirin?*

• Bi rastî, têkiliyên min bi helbestvanên wê demê re kêm bûn, ji ber ku min didît ku zimanê wan ne ewqas xurt e, zimanê min pê dinivîsand, zimanê standard û petî bû, ne zimanê gelêrî bû.

*P4. Çi bandora nivîsên Mîr Celadet Bedirxan, Osman Sebrî, Dr. Nûredîn Zaza, Qedrî Can, Dr. Kamîran Bedirxan … û hevalên wan li vîna keç û lawên wê serdemê hebû?*

• Ji kesên ku di warê zimên de têkiliya min bi wan re hebû, apê Osman Sebrî bû, du caran li Qamişloyê min serdana wî kiriye, lê mixabin ku min mîr Celadet û Dr. Nûredîn Zaza nedîtin.

*P5. Te helbest û vekolînên*

..... 8

# Herdu baskên Partiya Demokarat a Kurdistan a Îranê yekîtiya xwe birin serî



Piştî danûsatndin û gotûbêjên biratî, bi pêngaveke dîrokî, herdu baskên Partiya Demokarat a Kurdistan a Îranê yekîtiya Partiya xwe serkeftî birin serî.

Bi vê boneya giring, Partiya me, Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê, nameyeke pîrozbahiyê ji Partiya bira re şand, ev e li jêr, deqa wê ye:

**Pîrozname**

**Bona:**

**Berêz Mustefa Hicrî…**

**Berêz Xalid Ezîzî…**

**Endamên serkirde, heval û hogirên herdu baskên Partî Demokratî Kurdistanî Îran…**

**Silav û rêz…**

Serkeftina diyalog û gotûbêjên we li ser rêya rêkeftinên bona cîbecîkirina yekrêziya xebat û têkoşîna Hizbî Demokrat li Kurdistana Îran û li derve, pêngaveke dîrokî, ciyê şahî û dilxweşiya gelê Kurd û hemî azadîxwaz û demokrathezan bû.

Em bi dil û can we hemiya pîroz dikin, hêvî û bawerî li cî ne ku, hûn dê her û her li ser rêya xebata dadmend û rewa li berambar nijadperestî û setemkariyê bin, ji bo pêkanîna Aştî, Azadî û Wekheviyê.

**Nivîsgeha Rêzanî Ya Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê**

*Qamişlo 24ê Tebaxa 2022an.*

**Hevpeyvîn ... Dûmahîk**

*wêjeyî bi zimanê Kurdî nivîsandine, gelo çima te ev beşên nivîsê bijartine?*

• Derbarê ziman û nivîsandina helbestê dikarim bêjim ku çi beşên wêjeyê hebin, pêwist e ew bi zimanekî Kurdî xurû û xurt bêne nivîsandin û gotinên zimanên din têde tune bin. Ew gotina ku di zaravayekî Kurdî de tune be, yan winda bûbe, bê guman ew di zaravayekî Kurdî din de heye, divê em wê bikar bînin. Ji ber vê hindê, di pirtûkeke xwe de, min rexne li gelek helbestvanan kiriye.

*P6. Tu rola tevgera Kurdî li Sûriyê di geşkirin û fêrkirina zimên de çawa dinirxînî?*

• Derbarê rola partiyên Kurdî di geşkirina zimanê dê de, ez dikarim bibêjim, tevî ku wan xwe li zimên dikirin xwedî jî, lê mixabin rola wan qels bû, ne li gora dihate xwestinê bû. Tişta ku gotina min tekez dike ew e, serkirdeyên partiyên me ji Cegerxwîn, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza… û hwd fêrî zimanê Kurdî nebûne!

Derbarê lêkolînên li ser zimanê Kurdî, ez baş di wî warî de xebitîme, û min pirtûk jî weşandine, û ji ber pabendiya min bi hişkiya zimên, min rexneyên wêjeyî û zimannasî li gelekan kirine, ji wan jî Cegerxwîn û Osman Sebrî.

Zimanê ku min pê dinivîsand, ne weke zimanê Kovarên Kurdî bû, lewra, ne min ji wan re dinivîsand, ne wan jî nivîsên min dipejirandin, lê ev nayê wateya ku belavok, rojname û kovarên Kurdî ne xwedî rol bûn, na... Ew berhem, û nivîskar û helbestvanên Kurd hemî xwedî rol bûn.

Careke din, dixwazim li ser helbestê biaxivim:

Pêwist e di hûnandina helbestê de, helbestvan bi movikan agahdar be, zanibe çawa movikan bikar bîne, wê çaxê, ez dikarim navê helbestê li nivîsa wî bikim.

*P7. Tu dixwazî çi ji keç û lawên xwe yên Kurd re bibêjî?*

• Li dawiyê, dixwazim ji keç, xort û partiyên Kurdî, û hemî Kurdan re bibêjim: Bi Kurdî bixwînin, bi Kurdiyeke xurû, petî bê gotinên biyanî binivîsin, bi zamanê xwe serbilind bin.

*Li dawiyê, bi navê deste û xwendevanên Rojnameya NEWROZ a ku eve bêtir ji 25 sala ye bi zimanê Kurdî li Sûriyê çap û belav dibe, em te spas dikin, hêviya temenekî dirêj û tenduristiyeke qenc ji te re dikin.*

• Ez spasiya we dikim, ji Rojnameya we re berdewamiyê dixwazim, ew zimanê ku hûn rojnameyê pê belav dikin, zimanekî xweş û paqij e.

*Hêjayî gotinê ye ku 8 berhemên mamoste Mehmûd çap û belv bûne, ew jî ev in:*

1- Nîgarên kul û derdên jiyanê-Helbest- sala 1996.

2- Nerînek di terazûya ristên Kurdî de- sala 1997.

3- Geştek li nav baxê ristên»Cizîrî»-Beşê yekem- sala 2000.

4- Hin hest û ramanên netewî û civakî- sala 2002.

5- Geştek li nav baxê ristên «Cizîrî»-Beşê duwem- sala 2003.

6- Doza giran û umîdên xwezga yên tevlihev- Helbest-Beşê yekem-sala 2006.

7- Doza giran û umîdên xwezga yên tevlihev- Helbest-Beşê yekem-sala 2007.

8- Cengên xaçparêzî û şikodariya berevaniya Kurdî-Vekolîn-sala- 2013.

# Raza dilê min... Çavên zeytûnî û xeyalên şevê

**Kalê Maratê**



Bayekî hênik xwe berdabû nava şeveke havînê, pelên daran û giya bi nazdariya xemla havînê radimûsandin û hêdî hêdî dihejandin. Di nava şeveke tarî de distira bi dilê dayikan, û xwe berdida nava landikên zarokan. Şeveke tarî bû heyva çardeşevî ronahiya xwe berdabû nava dilê esmên û hev du hembêz dikirin, esman û xweza mest dibûn.

Çavên zeytûnî li ser banê malê bi vê hembêzkirina efsûnî şa dibû û xwe berdida nava xeyalan, li benda mêvanên xwe bû, geh li esmên dinihêrî geh jî li rê. Piştî demekê bi dengê firîşteyan hate ser hişê xwe. Bi lez û bez ji banê malê hat xwarê û agahî da dayika xwe. Çavên zeytûnî li jinên ku li menzeleke biçûk bûn, û li bin ronahiya çirayê rûdiniştin nihêrî mîna firîşteyan dixuyan li ber çavên zeytûnî dipeyîvin nîqaş dikirin, nîqaşeke kûr û dirêj xwe berdabû nava menzelê çavên zeytûnî Ji xwe dipirsî.

Gelo berxwedan çi ye azadî çi ye? Lê Jin …

Peyva Jinê her dem dibihîsim erê peyva jinê di jiyana rojane de pir bihîstibû.

Lê wateya wê? Çavên zeytûnî di nav liv û lebateke mezin da bû, ji devê kîjan firşteyê peyvek derdiket bala xwe dida wê derê, weteya peyvan nedizanî lê peyvên efsûnî ji lêvên firîşteyan ewqas xweşik diherikîn giyanê wê mêjiyê wê mest dikir.

Dem diborî û peyvên watedar û şênber dinin kêlî bi kêlî xwe berdidan nava kûrahiya jiyanê jiyaneke ku bi deste firîşteyeke azadîxwaz dihat xemilandin.

Çirûska Agirê Xwebûnê. Hêdî hêdî dixemilî jiyana xwebûna jinê xwebûneke ku erd û esman pê vedijiyan û dijiyan.

Çirûskek agir bû xwebûna jinê ku agirê xwebûn û azadiyê gur û geş dikir tovek li bin axa pîroz bû, ku li ser rûyê erdê rastî, başî û bedewî şîn dikir ...

Ronahiya Dem Gerdûn û jiyanê. Berxwedana te jinê ji nû ve zayîna xakê bû ku belav dibû li erdê. Tovê li bin xaka pîroz dêm û alekên te maç dikirin Bi laşê xwe bi giyanê xwe tu dibûyî mêvana şevên pîroz û dibûyî çirûskeke êgir ku di nava xwe de ronahiya dem, gerdûn û jiyanê dihewand.

# Ji Kobniyê

**Arif Hiso**



Danasîna Kobaniyê: Kobaniyê bajarekî Kurdan e, di sala 1912 an de, li başûr rojavayî Kurdistanê li ser sînorê di navbera Sûriyê û Tirkiyê de, li Hemberî bajarê Sirûcê li Turkiyê ve hatiye damezirandin. Kobanî nêzîkî 160 KM bakurî rojhelatî Helebê ye, û bi dûrbûna 30 km î, li rojhilatî çemê Ferêt e.

Şêniyên Kobaniyê û gundên wê bi tevahî Kurd in, êlên Kobaniyê ên mezin sisê ne, ew jî ev in: Kêtik, Ilêdîn û Şêxin, û zêdetrî 360 gund, û du bajarokên ku nişteciyên wan jî Ereb in Şiyox û Sirîn bi herêmê ve girêdayî ne.

Hêjayî gotinê ye ku em bêjin ta sala 1936 an, bajarê Kobaniyê girêdayî herêma Cerablûsê bû. Nnavê kabaniyê Ingilîzî ye, dema ku ew kampaniya ku di şerê cîhanê yê yekemîn de, kar dikir û riya tirênê ji Alemaniya ta Bexdadê çêdikir, navê xwe jê wergirtiye.

Kobanî bi çandiniya genim, ceh, pembû, û di warê pêşeziyê jî çêkirina xerzan û kolandina bîrên avê ta gihiştin gelek dewletan wek Cezayir, Misir, Îraq, Senîgal û Nîcer navdar e.

Kobanî cihê tekoşerên kurd yên ku ji Turkiyê derbasî binxetê bûne mînak: Osman Sebrî, Qedrî Can, Celadet Bedirxan, Ihsan Nûrî Paşa û li vê dawiyê jî Ebdula Ocelan e.

Li vê dawiyê, ji aliyê komên çete û Daişê û hevalbendên wê ve, Kobanî û gundewarên wê, gelek astengî dîtine. Lê piştî ku bi hezaran keç û lawên wê ji bo axa pîroz canê xwe dane û rêxistina teror daye bezandin, ew bûye bajarê qehremanan û navê berxwedanê lê bûye.

*Kobanî: 27.08.2022*

# Gerebêtê Xaço kî ye?!

**Amadekirin û wergerandin: Mehfûzê mele Silêman**

Gerebêtê xaço sed sal kir, bi kurdî diśtrand, ji kurda û śtrana kurdî hez dikir, Gerebêtê Xaço bi nav û resenê xwe Ermen bû, lê bi dil û zimanê xwe kurd bû, navê wî yê bi ra Gerebêt Xacdûryan e, li gundê «Bilaydir» li herêma «Bişêriyê» qeza Batmanê ji Kurdiśtana bakur ji dêya xwe re bû ye.

Dema fermana Osmanî sala 1935an derbarê kêmjimarên olî û netewî derket, dihat bîra Gerebêt gava birek ji hêzên Hemîdî hatin gund, jin û mêr dikuştin û zarok dihiştin, bi herdû çavên xwe kuştina dê û bavê xwe dîtin, ew wêne di hişê wî de û li ber çavên wî zindî dima, û hundirê wî bi kûrayî birîn dikir.

Rêbiwariya xwe ya dirêj digel xwih û birayê xwe bi sêwîtî deśtpêkir, reviyan herêma «Reşkota», herdû salên 1917 û 1918 lê jiyan.

Ew bi xwe dibêje: (axaftina me ya xweş bi kurdî em ji mirinê rizgarkirin, çimkî di dernedixiśtin ku em ermen in), her wiha bêzar û hejar li nav gundan digeriyan.

Gava temenê xwiha wî bû 12 sal, yekî li gundekî ew xweśt, ew gund yê «Felîtê Quto» bû, pişt re Gerebêt śtranekê avête ser.

Piştî xwiha wî mêr dike, ew jî şivantiyê dike û śtranan dibêje, hinganê dengbêjê Ermen «Sako» û dengbêjê kurd «xwedêda» nas dike.

Carekê serokê hozê wî dibe Odeya (mêvangeha) xwe, ji hingî ve deng pêket û li hemî gundên hawîrdorê belavbû, ew dixweśtin da ji wan re di civat û şahiyên wan de biśtrê.

Dengê wî pir belav bû, nemaze piştî śtranek avêt ser «Felîtê Quto».

Bi dilekî şewitî û xemgîn mirina birayê wî di bîra wî tê, ku piştî temenê wî dibe 10 sal nexweş dikeve û can dispêre, Gerebêt nedikarî li ser bigirî, lê śtraneke xemgîn û bi şîn li ser digot.

Felekê dev jê berneda, deśt bi qûnaxeke nû kir, piştî şikeśtina şoreşa Şêx Se›îdê pîran di sala 1925an de penaber bû, di 1929an de berê xwe da bajarê Qamişlo û lê rûnişt, di 1931an de gihişte leşkerê Firensî (wekû karketekî mûçedar), çimkî Sûrî di bin deshilata Firensiyan de bû.

Di 1936an de xanima wî «Yeva Hagop» dibe hevjîna wî, keçek û çar kur ji wan re çê dibin. Pazde salan û sê mihan di karê xwe yê leşkerî de ma, heya 1946an, sala derketina Firensa ji sûrî.

Di dema karê xwe de, serdana Hisiça û Dêrezorê dikir. Çaxê derketina Firensiyan, jê xweśtin bi wan re here Firensa, û soz didanê ku li wir dilşad û bi rûmet bijî, digel ku bi wan re giha bendera Beirutê jî, lê ji dûv wan vegiriya Qamişlo, paşî biryar da ku here welatê xwe Hayiśtanê (Ermeinśtanê).

Qûnaxa wî ya dawî deśtpêkir, pir renc û zehmetî kişandin ta gihişt gundê «Soloxoza çaran» ji gundewarê «yirêvan» paytexta Ermeniśtana Sovyetî. Ew pêşwazî û bixêrhatina ku li wir guman dikir nedît, bi xizanî jiyan dikir, û her li gundên kurdên îzîdî diśtrand. Di sala 1950î de ji bal Êzge (radiyo) ya Yirêvanê beşa kurdî hat vexwendin, ew bû sedem ku li seranserê kurdiśtanê û cîhanê navdar bibe. Di radiyo de kar kir û gelek śtran tê de û li Amedê (Diyarbekir) tomar kirin.

Jiyana xwe hemî li wir û di nav zaro û neviyên xwe de bûrand ta 16ê çilê paşî (miha 12an) ji sala 2005 dema koça dawî kir, hevjîna wî «Yeva» jî berî wî sala 1976an çûbû ber dilovania xwedê (xweda ji wan xweş be).

Hunermendê kurd Mihemed Ekbaş filimekî belgekirî bi navê (dengek ji vê serdemê) ser jiyana wî derhêna, û nivîskar Salih kevirbirî jî pirtûkek bi navê {Hawara peyaseyê (sedsaliyê)}li ser jiyana wî afirand.

Giyanê wî şad û aram be…

Bîranîna wî herdemî



be…

Gerebêtê Xaço dê bimîne zindî bi deng û śtranên xwe ve di hiş û derûna her kurdekî de...

**Jêder û lêveger:**

- nameya dektora ya lêkolerê Holendî (Wendy Hamelink) bi navê (hozên kurdî û Ermen).
- kovara Avşîn.

**Evê tên hin ji śtranê wî ne:**

1- Eyşana Elî
2- Zembîlfiroş
3- Genc Xelîl
4- Xumxumê
5- Hesenîko
6- Lê dihol e
7- Bişêriyo
8- Lê lê Edûlê
9- Xezal
10- Felîtê Qutu
11- Silêmanê Miśtî
12- De Xalo
13- Mîrzikê Zaza
14- Lawikê Metînî(dayîkê)
15- Evdalê Zeynê
16- Hey babikê
17- Nûrê
18- Ey lo Mîro
19- Mîro wayê
20- Derwêşê Evdî
21- Yane yane
22- Lo dilo
23- Diyarbekir
24- Lê Canê
25- Saliho û Nûrê

# Nameyek ji Mîr Celadet Bedirxan re!

**Konê Reş**

Di roja 152022/7/an de (71) sal di ser koçkirina Mîr Celadet Bedirxan re derbas dibe. Bi min xweş e vê nameyê jê re bişînim!

Erê Mîr Celadet! Bi xêra bapîrê te Mîr Bedirxan serhildana Botanê giyanê Kurdperweriyê di hinavê bav û bapîrên me de hat çandin... Bi xêra te; ked û westandina te, Hawar û Ronahiya te, deriyê edeb û wêjeya kurdî a nûjen, bi tîpên latînî li ber me hat vekirin.

Belê Mîro, bi xêra we; kur û neviyên Mîr Bedirxan, em dikarin roja îro xwe di nav netewên cîhanê de peyebilind bibînin. Erê, bi saya Mîr Bedirxan yekemîn serhildana kurdî a netewî dest pê kir... Bi saya kurê wî Miqdad Medhet Bedirxan, bingehê rojnamegeriya kurdî ji me re hat vekirin, bi saya te û Hawara te zimanê me bi alfabeya latînî hat nivîsandin û em bûn xwedî alfabeyeke xweser... Zimanê me ji axaftinê bû zimanê nivîsandinê û roja îro gelek nivîskarên Kurd ji Bakur, Rojava û piraniya kurdên Ewropa bi wê alfabeya te dixwînin û dinîvisînin û wek ku te gotiye, ev şîreta te pêk anîne:

«Miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi du qeweta, du çekan diparêzin: Ol yek, Ziman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek bibe, hingî çek yek bitenê ye, û bend tenê ziman e».

Lê sed mixabin, ji rexekî din ve, hêjî pêdiviya me bi wek van gotinên te heye:

«Malxerabo! Ma we ew çend wext nîne, ko hûn ji bo hînbûna zimanê biyaniyan bi salane ve xebitîne û îro jî dixebitin. ji bona ko bikarin (fînfoneke) derewîn bi lêv bikin. Kuro eyb e, şerme, fihête, an hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bibin, an mebêjin em Kurdin. Bê ziman Kurdîtî ji we ra ne romete, ji me ra rûreşîyeke giran e. Heyf û xebînet û hezar mixabin, nemaze ji wan ra ko bi zimanên din dizanin bixwînin û binivîsînin û alfabêya zimanê xwe hêj nas nakin...» Mîr Celadet Bedirxan, kovara Hawar, hejmar (27) Şam /1941.

Erê Mîro! Bi xêra herdu kovarên te; (Hawar û Ronahî) û herdu rojnameyên birayê te Dr. Kamîran Bedrixan (Stêr û Roja Nû), nivîskar û helbestvanên bejin bilind di hola afirandin û nivîsandina çanda kurdî de hatin meydanê, wek; Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Ehmedê Namî… hwd. Û bi weşana Hawarê re, helbesta kurdî ya nûjen bi pênûsa te, birayê te Dr. Kamîran û



Qedrî Can xwe eşkere kir... Herwiha jî, kurteçîroka kurdî ya hunerî bi pênûsa Dr. Nûredîn Zaza serê xwe bilind kir.

Erê Mîro! Eger mirov li dîroka malbata te vegere û berpêl bike, wê bibîne ku tevayî neferên malbata te di sirgûn û zîvariyan de hatine kuştin û mirin... Îro ji mafê we ye ku, em her sal we bibîr bînin û navên we bi tîpên zêrîn di dîroka xwe de binivîsin. Gelo! Ku em we bibîr neyînin, wê kî we bibîr bîne? Silav li giyanê we be.

*Qamişlo, 13.07.2022an*

## Nivîskara Kurd Mizgîn Ronak piştî 30 salî ji zindana Amedê serbest hate berdan

Roja Çarşembê 10.08.2022, nivîskar û çalakvana Kurd Mizgîn Ronak, piştî derbaskirina 30 salî di zindanên zordariya dewleta kûr a Turkiyê de serbest hate berdan. Mizgîna jîr a xebatkar, ji ber xebat û tevgera xwe, di 19saliya xwe de hate zindankirin û bi temenê 49 salî ji zinadanê hate berdan. Di zindana xwe de jî, Mizgîna Kurd xebata xwe ya wêjeyî berdewam kir û gelek pirtûk nivîsandin, ji wan pirtûkan romana»Dergevanên kulîlkên Kobanê».

Li ber dergehên zindanê, Bi kul û hesreteke mezin Mizgîn got:

(Ta ku hevalên me di zindanê de ne, azadî, ne azadî ye!)

**(Ta ku hevalên me di zindanê de ne, azadî, ne azadî ye!)**



# Li welêt û derveyî welêt Xwendekarên Kurd ên serketî hatin xelatkirin

Eger pêwistî û giringiya gelên cîhanê carekê bi zanîn, çand û hunerê hebe, giringiya gelê me yê Kurdê perîşanê ku ji hemî mafên xwe bêpar bûye, di cîhana me ya îro de, di bin nîrê bindestî û koletiyê de dinale, deh caran bi xwendin û zanînê heye, ji xwendin û zanînê pêve, tu rê li pêş jiyaneke bi rûmet tune ye.

Lewra, û ji ber baweriya me ya bêsînor bi xwendin û zanînê, ne diho-pêr, lê ji berî 25 salan ve, her û her me giringî daye xwendinê, nav di keç û lawên Kurd daye da ku ji kaniyên zanînê vexun, ji bo sibe ew di civaka xwe de bibine mînak, rêya azadî û serfiraziyê nîşa gelê xwe bidin û serkêşiya xebata wî bikin.

Îsal jî mîna her sal. Çi li welêt, çi li derveyî welêt, xwendekarên Kurd ên di pola 9 û 12an de serketî bûn, ew ji bal rêxistinên partriyê ve hatin xelatkirin.

Li dever û bajarê Helebê, herêma Cizîrê, Herêma Kurdistanê, li Almanya, Swêdê, Swêsra û Danîmarkê…û hwd, bi sedan keç û lawên Kurd hatin xelatkirin.

Serkeftina Xwendekarên me pîroz be, û em hêviya paşerojeke ronak ji wan re dixwazin. Herweha bi navê Desteya Newrozê, em spasiya rêxistinên partiyê dikin ku di vî karî de westan û cefa kişandine.

Li dawiyê, em jî gotina Seydayê Cegerxwîn dubare dikin û dibêjin:

Xwendin neb ekes naçe pêş

peyda dibin pir derd û êş.

Li jêr, hin dîmenên xelatkirinê ji we re diweşînin:









# Li Helebê jî xelatkirina xwendekarên serketî

Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li ya Sûriyê – Rêxistina Helebê. Li bajarê Helebê taxa Şêxmeqûsd (çiyayê Seydo). Di hola Efrînê de li dîroka 29 -Tebaxê -022an. Şahiya xelatkirina xwendekarên ji pola nehan û bekeloriya bi hemî şaxên wê ve li darxist. Ev lîsta xelatkirinê ye.

Bekeloriye şaxê zanistî -168

Bekloriye şaxê wêjeyî - 25

Bekloriye şaxên din – 7

Beşê kurdî - 3

Pola nehan – 277

Tevahî – 480



**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**